



COMBINED JOINT TASK FORCE OPERATION INHERENT RESOLVE

Public Affairs Office

May 22, 2020
Release No. 20200522-01
FOR IMMEDIATE RELEASE

Du fermanarên DAIŞê yê xwecihî di operasyonek HSD û Koalîsyonê de hatin kuştin.

Di 17'ê Gulanê de, Hêzên Sûriya Demokratîk bi hevalbenda Koalîsyonê re li parêzgeha Dêrazorê ya Sûriyê bi ser cihekî DAIŞê de girtin.

Her du fermanarên DAIŞê Ehmed (Îsa Ismaîl El-Zewaî) û Ehmed (Ebid Mihmed Hesên El-Cûxeyfî), di vê operasyonê de hatin kuştin.

Ehmed (Îsa Ismaîl El-Zewaî) wekî Ebû Elî El-Bexdadî tê naskirin, waliyê bakurê Bexdadê bû. Wekî fermanarekî herêmî, El-Zawî jî berpirsyarê belavkirina perspektîvên terorîstî ji fermandariya DAIŞê ji bo endaman li bakurî Bexdayê bû.

Ehmed (Ebid Mihmed Hesên El-Cûxeyfî), wekî Ebû Emar tê naskirin, berpirsê locistî û peydakirina pêwîstiyên di nava DAIŞê de bû, di heman demê de berpirsê veguhestina çek, mayîn û endamên DAIŞê yê li tevahiya Iraq û Sûriyê bû.

Kuştina van her du fermanaran, wê êrîşên siberojî li dijî sivîlan û hevalbendên me yê ewlekarî bêkêr bike.

Di encama fişara zêde ya HSDê de berpirsên DAIŞê li herêmê kêmbûn.

Hevalbendên Koalîsyonê, li Sûriyê û Iraqê zexta xwe li ser DAIŞê dewam dikin, da ku ji nû ve dernekeve. Koalîsyon jî bi riya şêwira payebilind, parvekirina agahiyên îstîxbaratî û hewayî piştgiriya HSDê dike.

-30-